

Di pêşketina zimanî de giringiya wergêrê



Lokman Polat

*„Eger hûn kurd dixwazin bikevin nav milletên neteweyên- medenî klasîkên edebiyata cîhanê - dunyayê -wergêrînin.“
Ebdullah Cevdet*

Yê ku ziman û edebiyata nivîskî dewlemend dike/ yek jî wergere. Ji bo pêşketina edebiyatê û dewlemendiya zimên wergêr xwedan roleke girînge. Gelek zimanên qels, ji xêra wergêrê re dewlemend bûn, pêş ketin. Li Tirkîyê piştê damezrandina komarê nivîsiingehen wergêrê yên fermî hatin damezrandin, bi navê “Tercume Burosu - Nivîsiingeha Wergêrê” vekirin û dest bi wergêrê kirin, edebiyata cîhanê ya klasîk hemû wergêrandin zimanê Tirkî. Hêj jî ji aliyê dewleta Tirk ve her sal bi sedan pertukên klasîk û yên modern dihêne wergêrandin. Tirkan ji xêra wergêrê re zimanê xwe pêşve birin, dewlemend kirin.

Kurd jî divê giringiyê bidin ser wergêrê. Ji hemû zimanan bêtir pêwîstiya zimanê kurdî bi wergêrê heye. Ji bo ku gelek kêr berhemên biyaniyan têne wergêrandin sebebê xwe heye. Helbet gelek sedem hene, lê ya bingehîn bê dewletbûna kurdane. (Mebest bakurê Kurdistanê ye.) Heger dewleteke kurdan heba dê dezgehên wan yên wergêrê jî hebana û dê her sal bi sedan pertuk bihatana wergêrandin.

Li Swêdê di salek de -di sala 1997-ê de - 963 pertuk hatine wergêrandin. Di hêla wergêrê de yê herî qels kurdin. Di saleke de sê, çar pertuk ancax têne wergêrandin. Pertukên xwerû bi kurdî herî pir

li Swêdê têne weşandin, lê mirov gava li pertukên wergerê dinire gelek kê m in. Di yek salek de di sala 1998-ê de - tenê çar pertuk hatine wergerandin. Di dema çûyî de weşanxaneya Welat -ev weşanxane li Swêdê bû- çend pertukên klasîk wergerandin kurdî, lê paşê ev weşanxane jî hate girtin. Bi navê "Nûdem Werger" kovareke xwerû wergerê derket, lê ew jî hetanî niha tenê 1 hejmar hate weşandinê. Niha weşanxaneya Nûdem û ya Helwest giranî dane ser pertukên wergerê û pertukên wergerê diweşînin.

Werger divê li gorî qaîde, rêziman û rastnivîsîna wî zimanî be.

Werger çiyê? Werger nivîsek ji zimanekê veguhêztina zimanekê dine. Yanê veguhertina nivîs û axaftinê re werger diheete gotin.

Werger ne hêsane, gelek zehmete. Di wergerê de gelek zehmetî derdikevin pêşberê mirov. Di saziya hevokan de zehmetî heye, divê wateya hevokê nehê guhertin, lê nabe ku mirov peyv bi peyv wergerîne. Werger divê li gorî şewaz, rêziman û rastnivîsîna wî zimanî be. Di wateya peyvên de mirov hinek zehmetî dikşîne. Hinek kelîme hene ku di zimanê din de wateya xwe ya raste rast bide tune. Divê mirov jê re peyveke bibîne ku wateya wê hevokê xirab neke.

Xweşî û başiya wergerê û her weha pêdiviya wergerê gelek heye. Werger zanîna mirov zêde dike, zimanê mirov dewlemend dike. Hinek peyv, peyv hene ku qet di bîra mirov de nîne, wexta mirov bi karê wergerê re mijul dibe mirov li ser wan peyvên jibîrkirî difikire û ew peyvên jibîrkirî bi bîr dihîne, yan jî ku mirov nizanibe li ferhengê dinêre û wê peyvê ji nû ve fêr dibe.

Li Swêdê bi hezaran pertuk bi zimanê Swêdî hatine wergerandin. Li bi kurdî pir hindik pertuk hatine wergerandin. Helbet kêmbûn û zêdebûna wergerandina pertukan bi qelsî an dewlemendiya zimanê Swêdî û kurdî ve girêdayî nîn e. Sedem ji neîmkanbûna rewşa kurdan tê, sedem ji aloziya rewşa aborî ya kurdan tê. Ez mamosteke ku di dibîstanên Stockholmê de darsa kurdî dide, dinasim, wî ji Swêdî du pertuk wergerandiye kurdî, lê îmkanên wî yê aborî dest nade ku herdu pertukan çap bike. Helbet kêmbûna wergerên kurd jî

ji bo kêmwergera berheman sedemeke dine. Di nav kurdan de wergêr profesyonel nîne. Wergêr heyî, hem û jî amatorin. Ew di dema xwe ya vala de bi karê wergêriyê mijuul dibin. Û ji bo wergêriya xwe yek kronêk jî qazanç nakin. Yanê ji bo wergerê ji çi ciheke heq nastînin. Bi gotina vekirî pertukan belaş werdigerînin.



Di kovarên kurdî de jî divê nivîsên wergerê bihêne weşandin. Lewre ji bo pêşveçûna çand, edebiyat û zimanê kurdî rola kovarên kurdî gelek girînge. Xebatkarên kovarên kurdî bi dil û can xizmet dikin. Ev

rastîyeke ku; ji bo dewlemendiya naveroka kovaran werger pêwîstînin. Kovarên kurdî ji bo ku kêmnivîsên wergerê diweşînin, ew jî ji ser bêşiyana wane. Heger hinek mirov nivîs wergerînin kurdî û ji kovaran re bişînin, kovarên kurdî dê bi dilxweşî wan nivîsên wergerê biweşînin. Dema min kovara Helwestê diweşand, nivîsên wergerê ku dihatin, min hemuu diweşand.

Pertukên wergerê yên ku di nav weşanên Helwestê de derketine evin :

1 Romeo û Juliet Shakespeare, 2 Bazirganê Venîsiya Shakespeare, 3 Peyamber Xelîl Cibran, 4 Baxçeyê Peyamber Xelîl Cibran, 5 Baskên Şkestî Xelîl Cibran, 6 - Çîrokên Kurmancî Aleksander Jaba, 7 Çîroka Evîne Samed Behrengî, 8 Edik û Bedik Samed Behrengî, 9 Çîrokên Lawikê Keçel Îsmail Karabiyik, 10 Ji Nav Edebiyata Swêdê

Hinek pertukên Çeexov, Tolstoy, Dostoyevskî, Shakespeare, Pîrandelo û yd, li kurdî hatine wergerandin û ji bo çapê di dorê de